

Dema hûn bi koronavîrusê enfekte bûn, divê hûn:

- Xwe li malê cuda bikin ji bo 48 saetan piştî semptom derbas bûn
- Zêdetir bala xwe bidin ser paqijî û şuştinê
- Mirovan agahdar bikin ku dibe hûn enfekte bûne lewre ew dikarin testê bikin



Xwe an jî kesên din sûcdar nekin ji ber enfektebûna bi koronavîrusa nû. Bila di bîra we de be ku nexweşî ji ber vîrusê çêdibe, ne ji ber takekesan, û koronavîrusa nû jî gelek têger e.

Cudakirina li malê tê vê wateyê:



Li malê bimînin da ku têkiliya nêzik bi kesên din re çênebe. Neçin ser kar û neçin derve. Bila kesên din alîkariyê ji bo kirin û standinê û tiştên din bidin we. Destûrê nedin ku mêvan bikevin mala we. Telefonê an jî lêgerînên vîdeoyê bi kar binin li dewsa wê.



Ji têkiliya nêzik a bi mirovên ku hûn bi hev re dijîn dûr bimînin. Ji mirovên din bi qasî 2 metreyan dûr bisekinin, û wek mînak ji ramûsîn û hembêzkirinê dûr bimînin. Ji razana bi hev re dûr bimînin û ji derbaskirina demeke dirêj a di heman odê de dûr bimînin. Divê hûn rûxarên serşokan bi xwe piştî bikaranînê paqij bikin, bo nimûne rûniştokên tuvaletan, lavaboyan û lûleyan, beriya ku kesên din wan bi kar binin. Ev yek bi taybetî girîng dibe eger hûn bi kesek xwedî rîska bilind a nexweşiya tund li hember COVID-19ê re dijîn.



Divê hûn maskeyeke sûretê ya bi marqeya-CE ya yekcarî bi kar binin eger sedemeke we ya esasî hebe ji bo terkdayîna malê, wek mînak eger hûn biçin nexweşxaneyê.

Eger hûn bi koronavîrusê enfekte bûne û xwedî fikar in ku hûn nikarin li malê xwe cuda bikin, divê hûn li bijîşkê xwe bigerin ku ew dikare pêşniyarê li we bike. Şaredariya we dikare bibe alîkar da ku hûn li derveyê mala xwe cuda bin.

21.08.2020



Dema hûn bi koronavîrusê enfekte bûn, divê hûn:

- Xwe li malê cuda bikin ji bo 48 saetan piştî semptom derbas bûn
- Zêdetir bala xwe bidin ser paqijî û şûştinê
- Mirovan agahdar bikin ku dibe hûn enfekte bûne lewre ew dikarin testê bikin



Xwe an jî kesên din sûcdar nekin ji ber enfektebûna bi koronavîrusa nû. Bila di bîra we de be ku nexweşî ji ber vîrusê çêdibe, ne ji ber takekesan, û koronavîrusa nû jî gelek têger e.

Paqijiya baş û şûstin tê vê wateyê:



Pirî caran destên xwe bi sabûn û avê bi timamî bişon, an jî paqijkera dest bi kar bînin eger we nekarî hûn xwe bigihînin sabûn û avê. Bikaranîna paqijkera dest bi qasî destşûştinê kêrhatî ye, lê em pêşniyar dikin ku hûn destên xwe bişon eger bi awayekî kifşe qirêj an jî ter xuya bikin, piştî çûna tuvaletê, piştî guhertina pîneyên zarokan û piştî destdayîna bi xwarinê.



Destên xwe li sûretê xwe nedin. Bikuxin an jî bipişkin nav mendîleke yekcarî an jî nav enîşka xwe. Mendîlên yekcarî yên hatine bikaranîn bixin nav zibildankê û qahîm girê bidin.



Pêjgîran li gel mirovên din parve nekin. Bi tenê ya xwe bi kar bînin.



Odeya(yên) hûn dema ku nexweş in wextê xwe tê de derbas dikin divê rojane bîn paqijkirin. Hêmanên paqijkirinê yên edetî bi kar bînin. Bi taybetî girîng e ku hûn tiştan û rûxaran paqij bikin ku kesên din dest lê dane.



Dema hûn bi koronavîrusê enfekte bûn, divê hûn:

- Xwe li malê cuda bikin ji bo 48 saetan piştî semptom derbas bûn
- Zêdetir bala xwe bidin ser paqijî û şuştinê
- Mirovan agahdar bikin ku dibe hûn enfekte bûne lewre ew dikarin testê bikin



Xwe an jî kesên din sûcdar nekin ji ber enfektebûna bi koronavîrusa nû. Bila di bîra we de be ku nexweşî ji ber vîrusê çêdibe, ne ji ber takekesan, û koronavîrusa nû jî gelek têger e.

Agahdarkirina kesên ku dibe we ew enfekte kirine tê vê wateyê:

Divê hûn mirovên ku têkiliya we ya nêzik* 48 saet beriya destpêkirina semptomên û 48 saet piştî xilasbûna semptomên bi wan re çêbûye agahdar bikin. Ew dikarin hingê bê testkirin. Hûn dikarin ji bijîşkê xwe an jî ji xebatkarên li Coronaopsporing (Şopandina Koronayê) alîkariyê wergirin. Ew ê li we bigerin eger testên we nîşan bidin ku hûn enfekte bûne. Hûn bi xwe jî dikarin li wan bigerin bi rêya jimareya **32 32 05 11**.

*Têkiliyên we yên nêzik ew in:

- Mirovên ku hûn pê re dijîn
- Mirovên ku têkiliya we ya fizîkî ya rasterast pê re çêbûye (wek mînak bi rêya ramûsîn û hembêzkerinê)
- Mirovên ku hûn bê hemdê xwe kuxiyar/pişkiyan ser an jî mirovên ku destê xwe li mendilên we bi kar anî dane.
- Mirovên ku têkiliya we ya nêzik a rû bi rû bi mesafeyek ji yek metreyê kêmtir ya zêdetirî 15 deqeyan çêbûyî (wek mînak bi rêya axaftinê). Yek metre bi qasî mesafeya firehiya deriyê derve ye.
- Xebatkarên tenduristiyê yên ku beşdarî xudankirin/tedawiya we bûne û maskeya sûretê an jî mertala sûretê bi kar neanîne.